

Schleswig-Holstein  
Der echte Norden

**Ji Dayik û Bavên Xwendekaran re**

**Ji Dibistanê seretayî**

**û navendên pistgîrîyê (polên 1 heta 4 ê)**

### **Agehdarî li ser derzîlêdana li dijî COVID-19**

Dayîk û bavên hêja,

ji 24ê Gulana 2022an vir ve, pêsniyara jêrîn ya Komîsyona Vaksenlêdanê ya daîmî (STIKO) derbas dibe.

- Vaksînêdan li dijî COVID-19 bi **dozek** destpêkê ya Vaksînêdanê ji bo hemî zarokên 5 heta 11 Salî tê pêsniyar kirin.
- Jibo zarokên bi hîn nexwesiyên berê re, pêsniyar bi du Vaksînêdanan, ya bingehîn peyda dike û li ser bingeha pêsniyara Vaksînêdanê ya nû vekirî ya 18ê Tebaxa 2022 an a dû vaksenlêdana zêkar.
- Jibo zarokên saxlem du dozên vaksenlêdanê têne pêsniyar kirin ku di wan de bin hawirdora nêzik mirovên di xeterîya metin de ji bo qursek giran a COVID-19 hene ku bi xwe bi Vaksînêdanê nikarin bi ewlehî werin parastin.
- Ji bo zarokên ku berê tusî SARS-CoV-2 wate bi Vîrusa Corona yê ketine, divê ew derzîlêdanê ne zûtir ji 3 mehan pistî efeksiyonê bistînin.
- Enfeksiyonek berê (nîsanê Vîrusê an asîmptomatikî) bi tenê têrê nake kû pêsî li Nexwesiyên COVID-19 yên pasîn ên bi celebên vîrusê yên naskirî an nû bigire. Li gorî STIKO, tenê li gel dozeya derzîlêdanê ya pêsniyarkirî, tûsbûn anku enfeksiyona ku berê hatî ceribandin dibe sedema pêskeftina berevanîya bingehîn wate hêza berevanîya lasî zêde dike.

Ji bilî pêsniyara STIKO, em dizwaz in hin agahîyan bidin we ka cima vaksînêdana Koronayê ji hêla bijîjkî ve ji bo zarokên 5 heta 11 salî jî girîng e, da ku hûn biryar bidin ka hûn dixwaz in zarokên xwe li dijî vîrusê derzî bikin an na. Ewe gelek girîng e.

Têkilîya zarokan bi kesên din re, wek mînak li dibistanê yan jî li navendên lênêrînê (agehdar bûnê) rojane, pir zêde ye. Ev tê vê wateyê ku xeterk bingehîn a peydakirin anjî

tûsbûna bi vîrusa Koronayê heye. Ev bi taybetî ji bo guhertoya besa Omi-kron ê vergirtir derbas dibe.

Rast e ku gelek zarok dema ku bi vîrusa Koronayê dikevin, nîsanên nexwesîyê tune an tenê sivik cêdibin anku bi sivikî nîsan pêre dîyarin. Lêbelê, di rewsên kê m de, qursek girantir a nexwesîyê cêdibe. Zarokên ku hin sert û mercên berê hene bi taybetî di xeterîyê de ne.

Wekî din, Zarokên ku bi Vîrusa Koronayê ketine dikarin Vîrusê bigihînin kesên din tevî ku ew bi xwe nîsanên nexwesîyê tune bin.

Derzîlêdana li dijî Vîrusa Koronayê dibe sedem ku Zarok kê m caran tusî Vîrusê bibin. Berî her tistî, Vaksînlêdan xetera qursek giran a nexwesîyê kê m dike.

Heger û n birayarê bidin ku Vaksîna Koronayê li Zarokên xwe bidin, doktorê Zarokan an jî doktorê malbatê bi bawerîyek bercav vê cendê pêskes diket. Her weha hûn dikarin randevûyên derzîlêdanê ji bo Zarokên 5 heta 11 salî li Schleswig-Holstein ê tomar bikin. Hûn dikarin hîn zêdetir agahdarîyan li ser wan derên Vaksînlêdanê encam didin li

vir bibînin: <http://www.impfen-sh.de>

Dayîk û Bavên ku bi Zarokên xwe re dicin randevûya derzîlêdan li navendeke derzîlêdanê dikarin ew jî derzîyê li xwe bixin. Ji bo yekê ne hewce ye ku randevûyek cûda were girtin.

#### **Ger agahdarîyên bê tir hewce bike:**

Enstîtuya Robert Koch bersiva gelek pirsan di derbarê Vaksînlêdanê de dide (mînak di derbarê Vaksînlêdanê û bandorênalî her weha di derbarê wêneyên Klînîk ê de PIMS û long Covid):  
[https://www.rki.de/SharedDocs/FAQ/COVID-Impfen/FAQ\\_Liste\\_Impfung\\_Kinder\\_Jugendliche.html](https://www.rki.de/SharedDocs/FAQ/COVID-Impfen/FAQ_Liste_Impfung_Kinder_Jugendliche.html)

Navenda Federal a Perwerdehîya Tenduristîyê jî agahdarîyan dide  
<https://www.infektionsschutz.de/coronavirus/schutzimpfung/impfung-bei-kindern-und-jugendlichen/>

#### **Ligel rêzên taybet**

#### **Projeya navendên Vaksînlêdanê yê n li**

#### **seranserî welat ya wezareta Dad û Tenduristîyê**